

## Îtirazkirina rawestandin yan derkirinê

### Kaxeza rastiyê ya dêûbav/lênerîvan

#### Îtirazkirin çî ye?

Îtirazkirin dema ku hûn daxwaz dikin ku biryarek careke din were dîtin. Ev jî ji ber ku hûn bi biryara ku hatî girtin ne razî ne.

#### Ez ê çawa rawestandin yan derkirinê îtiraz bikim?

Heke hûn bawer dikin ku midûr biryarek ne adilane an jî projeyên rast neşopandiye. Xwendevan, dêûbav û nêrevan dikarin [forma îtirazê](#) dagirin.

Îtiraz dikarin li [Ofisa Perwerdehiyê](#) ya herêmî were kirin. Ofisa Perwerdehiyê ya herêmî dikare ji we re bibe alîkar ku hûn pêvajoyê fêm bikin. Ew jî dikarin ji we re bibin alîkar ku hûn daxwaz nameyê binivîsin. Xwendgeha zarokê we dikare agahdariya têkiliyê ji bo Ofisa Perwerdehiya we ya herêmî peyda bike.

Ji bo her biryarekê tenê îtirazek dikare were kirin. Biryarek derbarê îtirazê de ji hêla Rêvebir, Serkirdayetiya Perwerdehiyê yan Rêvebirek, Performansa Xwendegêhê ve were dayîn û dê di navbera 15 û 20 rojên xwendegêhê de were girtin. Dema ku îtiraz hat kirin û biryar hat dayîn dê têkilîyê bi we re daynin. Eger pêdiviya we bi agahiyên zêdetir hebin, hûn dikarin bi Daîreya Perwerdehiyê ya herêmî ya ku îtiraz lê hatiye kirin re têkilî daynin.

#### Encama îtiraza rawestandinê

Ger îtiraza li ser rawestandinê were pejiwandin, û biryarder bi daxwaza we razî be, mûdîr dê bi we re têkilî daynin da ku piştrast bikin ku zarokê we vegere xwendegêhê di zûtirîn dem de. Biryara îtirazê dê li ser qeydên zarokê we were tomar kirin û sekinandin dê ji qeyda zarokê we were rakirin.

Ger îtiraza li ser rawestandinê neyê piştgirî kirin, û biryarder bi daxwaza we razî nebe, zarokê we dê heya roja ku lihevkerî li ser rawestandinê bimîne.

#### Encama jî îtiraza derkirinê

Ger îtiraza derbarê derkirinê de were piştgirî kirin, û biryarder bi daxwaza we razî be, dê mudûr bi we re kar bike da ku pişgirîkên ewlehiyê yê cidî çareser bike û tedbîrên piştgiriyê bide da ku zarokê we vegere xwendegêhê. Biryara îtirazê dê di qeydên zarokê we de were nivîsandin û derxistin dê were rakirin ji qeydê zarokê we.

Ger îtiraza derkirinê neyê piştgirî kirin, û biryarder bi daxwaza we razî nebe, dibe ku gelek vebijarkên din li ber destê zarokê we hebin. Di hin rewşan de, dibe ku biryarek were dayîn ku hûn zarokê xwe li xwendegêheke din yan cîhekî din yê ku li gorî hewcedariyên wan guncantir bi cîh bikin. Ger ev çêbibe midûr dê bi we re kar bike.

Ger îtiraza derkirinê neyê piştgirî kirin û zarokê we ji 17 salî mezintir be, divê hûn û zarokê xwe li vebijarkan bigerin ku fêrbûnê bidomînin an veguhezînin bo ser kar.

#### Ez dê çawa gilî bikim?

Agahiyên li ser [parêzvaniya ji bo zarokê weji](#) bo dêûbavan hene. Agahdariya li ser [şikarê krinê](#) jî heye, ger hîn jî fikarên we li ser pêvajoya îtiraza rawestandin an derxistinê hebin.

Agahiyên li ser danûstendina bi xwendegêhan re di [Peymana Civaka Xwendegêhê](#) de têne pêşkêş kirin.

#### Xizmeta wergerandina telefoni

Heke hûn dixwazin bi xwendegêhê re têkiliyê daynin û ji bo Îngilîzî hewcedariya we bi alîkariyê heye, ji kerema xwe telefone xizmeta wergêriyê 131 450 bikin, ji wan re bêjin hûn çî zimanî diaxafin û ji operator bixwazin ku telefone xwendegêhê bike. Operator dê wergêr li ser xetê peyda bike da ku alîkariya we bike. Ev xizmet bê pereye.